131

# BÊNDER

*Helbest*

Diya Ciwan

* **Bênder**
* Helbest - **Diya Ciwan**
* Derhênan: **Mesûd Xelef**
* Çapxane: **HAWAR-DUHOK**
* Tîraj: **750**
* Jimara sipardinê: **313**

**Ji Weşanên Êkîtiya Nivîserên Kurd - Duhok**
**www.duhokwriters.net**

131

# BÊNDER

*Helbest*

**Diya Ciwan**

# *Diyarî*

**Ji bo**
**Her mînakên wek te hebin**
**Haveynê berxwedana me**
**Sincperwera Kurd; Leyla Qasim**

*Diya Ciwan*

# Xewneke azad

Çendî pêdiviyê xewneke azad im
Da ku bi destê min bigire û
Min pênc hezar sal pêş ve bibe
Yan
    Sedhezar sal bi şûnde vegerîne
Nexeme
Tenê min ji vî cihî bilivîne
                        Ji vê gorê hilkişîne
                        Ji vê demê raqetîne.

# W
# E
# L
# A
# T

Ez van her pênc tîpa
ji nav tîpan hildibijêrim û wan
di kehniyokên çavên xwe de
diçînim,
Da ku
Her û her şîn bimînin.

## Welato (2)

Min rondikên xwe
Hemî li ser axa te barandin
Bêyî ku ez hineka ji xwe re bihêlim
Da ku
Li ser xwe bigrîm
Min her roj
Rojek ji rojên temen
Raberî te dikir
Her pakrewanekî te
Hinek ji canê min bi xwe re veşart
Ta ku ji qalikê vala pêve
Ji mirinê re nehiştin

## Welato (3)

Dayik xwe qurbana zarokan dikin
Xuşk xwe qurbana bira dikin
Jin xwe qurbana mêra dikin
Evîndar xwe qurbana hevûdû dikin
Vêca
Ev hemî bi hevre
Bi yek carî
Xwe qurbana axa te dikin.

## Welato (4)

Tevî ku
        Tîp kuh dibin
        Guhtin diwestin
        Hêvî lal dibin
        Roj pîr dibin
        Ciwanî ji temen koçbar dike
        Riwê cîhanê jihevdikeve
Lê evîna te
  Mîna tuhvê parparê
        Di hemî quncikên can de
                        Şîn dibe
                              Û belav dibe.

## Welato (5)

Min divê ez te li pişta xwe bikim
Û te ji cihê te birevînim
Ji nava dojehê derînim
Ji mirinê dûr bixînim
Lê çi bikim!
Ne tu ji cihê xwe dilivî
Û ne tu dihêlî
Canê min ji te dûr bikeve.

## Welato (6)

Evîna min ji te re
Biqasî êşa te ye
Biqasî cugrafiya te ye
Ji lewra,
evîneke eşkereye
Û tu kiras li bejna wê nayên

## Welato (7)

Te dizanî
ko wê çendî derdê te mezin bin
Ji lewra
te hinde cugrafiya xwe mezin kiriye.

## Welato (8)

Her ku
Babên nuh
li deriyê hestê min dixin…
Tu dibî navbir
di navbera min û wan de
Tu xwe
li dora dest û tiliyên min dipêçî
Rûpelên min ji te re dibin deşt û zevî
Pênûsa min dibe gêsnekî kevnar
Û ez dibim cotkarekî pîr
Bi stiran û lorîkan re
Tîpên xwe
Di nav axa te de diçênim

## Welato (9)

Dê her û her
Ji welat re bilorînim
Ji ber ku
Her tişt di hundirê wî de ye
Û ew jî di hundirê her tiştî de ye

## Welato (10)

Dûr bim ji te nizanim kî me
Bi saxî jî, dûrî te, ez mirî me
Mirî li ba te ez bi jî me
Gelo heye li te vegerim

Bi çavên ronî
Bi hûr û kûr
Têr binerim
Li deşt û çiya tev bigerim
Paşê li kundêş vegerim
Bibînim agirê tenûrê
Bibhîzim dengê bilûrê
Ez rahêjim desteke gul
Berê xwe bidim gora pîrê
Zanim hê ez li bîra wê me.
Çendî mezin bim
Biçûkim
Li ber singa wê me

**Welato (11)**

Weke ku dil
Di singê de yekaneye
Mîna ku rok li asîmana
Yekaneye
Nala ku roja zayînê
Yekaneye
Her wekî roja mirinê yekaneye
Her weke yezdan ji bo me yekaneye
Her wiha jî evîna te di dil min de
Yekaneye

**Welat (12)**

Welat
Bi xwediyên xwe biha ye
Welatê bê xwedî be
          Kavilekî vala ye
Û mirovê bê welat be
          Sêwiyekî winda ye

**Welato (13)**

Mîna ku tu mala minî
Dilê min jî mala teye.

**Welato (14)**

Welatê min her yeke
Lê ma çi bikim
          Her roj
          Bi rengekî nuh
                    Xwe nîşa min dide.

# Barzanî(1)

Her ku ez têm
Li ber lingê te dirûnim
Kêla li ber serê te radimûsim
Ez ji bindestiyê tahir dibim..

## Barzanî (2)

Barzanî xetîreke vêketiye
Ronahiyê li her derî belavdike
Herçî bide dûv wê ronahiyê
Tu carî nalukume

## Barzanî (3)

Barzanî
Kurd û Kurdistan
Hemî kiribûn di dil û mejî yê xwe de
Ji lewre
Ew jî
Kete di dil û mejîyê hemî kurda de

# Helbesta min (1)

Heger rojekê
Hûn pêrgî helbesteke mişext hatin
Û we dît ku
Cihê şewatê di laşê wê de nemaye
Cihê şikestinê
Di hestiyên wê de nemaye
Cihê gullekê bi tenê
Di hestê wê de nemaye
Tûrikê azadiyê li milê wê ye
Nanê wê ji axê ye û
Ava wê ji xwînê ye
Baş bizanin
Ku ewê ji rekeha singa min bazdaye

## Helbest (2)

Ew helbesta ku
Bi serê xwe li deriyên hesinî nexîne
Ku li ber serê birîndaran nelorîne
Ku zarokan ji heft kolanan
li dora xwe necivîne
Ku her şev şevkê
bi min re şiyar nemîne
Wê naçênim ser rûpelan
Bila ronahiyê nebîne
Ez wê ji hundir bernadim
Ta ku arê tenûra dil wê bi şewtîne

## Helbest (3)

Çi mala helbesteke min tê de heye
Ew, mala min e
Û di hundirê her malikekê
            Di helbesta min de jî
                        Maleke mişext heye

## Helbest (4)

Ev helbest
Destpêkê di hundirê min de şîn dibin
Reh û repinê wan
   Di nava dil û kezebê de belav dibin
Paşê ez wan hildikişînim û
            Wan di mişarên rûpelên sipî de
                                        Diçînim

## Helbest (5)

Ew helbesta ku
            Bihna nanê tenûrê jê newê
            Bihna axê jê newê
            Bihna xwihdanê jê newê
Bihna helbestê jî ji wê nayê

## Helbest (6)

Ew helbesta ku
Rojê sê katjimêra
Li ber neynikê bimîne
Porê xwe şehke û
Bejna xwe bixemilîne
Ez li hêviya wê namînim.

## Helbestên min (7)

Helbestên min
Bi nanê Kurda xwedî dibin
Li kolanên wa dileyizin
Ders û dewrên xwe
Ji koçk û civatên wan distînin
Li ber derî û pencerên wan diponijin

# Ez û helbest

Ku hûn
Bixwazin
Min ji nêz ve binasin
Canê jiyana min
Bi destê xwe bipelînin
Rengê hêviyên min
Di dilê xwe de biçînin
Tenê
Rê bidin helbestên min
Da ku bi zikxişkî bikevin hundirê we
Ew bi xwe…
Xwe ji we re
Bixwînin.

# Helbestvan

Helbestvan,
Temenê xwe hemî dişewitîne
Da ku xelkê azad bibîne
Jibîr dike ku nema dikare
Temenek dî peydabike
Da ku xwe azad bibîne

# Helbestvano

Gelo te tu carî ji xwe pirsiye
Ka tu li helbestê dibî mihvan
Yan ew li te dibe mihvan!?
Tu wê şiyar dikî
Yan ew nahêle tu rakevî?
Tu wê vedijînî
Yan ew te dimrîne!?

# Evîna mezin

Tê bîra hewe roja 3-11-1996
Dema Cizîrê hefteyekê seranser
Xwe bi rondika şuşt
Nava wê dikelî
                    Difûrî
                    Pêl vedida
Bi hezaran dil liber xwe dibir
Tenê çima bajarê Qamişlokê
                    Kemalê xwe vegerand
                    Ew da ber singa xwe
Û ew
          Di nava tewên dilê xwe de
                                        Pêça…

# Evîna Duhokê

Duhok!
Çi cara ez te dibînim
Ji min heye ku ev cara pêşiye
Çi cara ku ez  xatira ji te dixwazim
Ji min heye ku wê ev cara dawî be

# Evîn (1)

Ji bo ku ava kaniya
Zelal bimîne
Roka me ronahiyê
Veweşîne
Xwerist her sibeh
Xwe ji nûve
Bixemlîne
Ji bo jiyan jîn bimîne
Me divê Xweda
Her roj
Her gav
Pencek
Evîn
Li vê qadê biwerîne

## Evîn (2)

Her ku we dît xizanî mezin dibe
Kîn û zikreşî xurtir dibe
Nakokî qelew dibe
Û bêbextî bilind dibe
Li pişt xwe binêrin
Li evînê vegerin
Wê bînin
Li devê her deriyekî biçînin
Li ser her rê û rêçikekê bireşînin

## Evîn (3)

Evîna min her yek evîn bû
Ji ber ku
Welatê min, tu evîndarên din
Di ber xwe re nedipijirandin.

## Evîn (4)

Em hemî qalikek valane
Berya ku evîn bikeve hundirê me.

# Dilê min (1)

Tevî ku dilê min gokek mezin bû jî
Lê ji zaroka pêve
Kesî nekarî pê bilîze…

## Dilê min (2)

Min dilê xwe diyarî tu kesî nekir
Ji ber ku min dizanî
Ku kes jî
Bi dilekî bûye çar parçe
Qayil nabe.

# Pênûsa min (1)

Pir caran
Pênûsa min dibe mîna kevirekî ku
Tu wê bavêje binê bîrekê de
Serê xwe di zikê xwe de diveşêre
Bê deng û liv dimîne
Ez destê xwe ji wê dişom
Bawer dikim
ku ew ber bi mirinê ve diçe
Ez gora wê, di rex ya dayika xwe de
dikolim
Hew dibînim
Ji nişka ve
Tîpên minî gerî tijî û çav şil
Bi destê hev digrin
Li dora cendekê wê dikin govend
Hinek ji wan dilîlînin
Hinek ji wan digrîn
Û hinek dikevin ber milê wê
Radikin şipya
Dîsa pênûsa min a bejinzirav
Çavê xwe mist dide û vedike
Li dora xwe dinêre
Mîna ku ji xeweke giran şiyar be
Li ser serê tiliyên xwe radiweste
Û
Bi tîpan re
Dikeve cenga semayê.

## Pênûsa min (2)

Ger tu nebî xencerek
Di nav destê pêşmergeyekî de
Yan dadekek
Di destê mendalekî de
Nebî tîrek
Di kevanê nêçîrvanekî de
Ne jî gêsnek di bin piyê cotkarekî de
Nebî rimek
Di nav penca rimbazekî de
Ne kilçovek
Di nav kilê zeriyekê de
Ne kopalek
Di bin çengê kalekî de
Lê ji kêmanî
Bibe derziyek
Di destê jinbiyekê de.

## PÊNÛS (1)

Ez bi nikilê pênûsa xwe
Dîwarên vê zindanê dikolim
Derî û pencera lê vedikim
Da ku di wan re
Derkevim
Herim
Jiyaneke nuh

## PÊNÛS (2)

Çendî
Em pênûsên xwe tûj dikin
Dê ew çend çekên xirab kuh bibin

# G U L Û Zindan

Gul dizane ka kê ew çandiye
Lê nizane ka wê kî serê wê jêbike
Lê
Zindan dizane ka kê ew avakiiriye
Û wê kî wê hilweşîne jî.

# G
# U
# L

Gul li xwîna xwe dibûre
Li ber
Serê xwe yê jêkirî û
Temenê xwe yê qurmiçandî jî
Nakeve
Tenê ku wê bidine destê evîndarekî
Yan jî azadîxwazekî.

# Gulav

Min tu gulav
Li bejn û bala xwe wernekirin
Piştî ku ji min re gotin:
Bihna welat ji te tê.

# Jiyan (1)

Dema ku em
    Jiyanê li xwe bikin kavlek wêran
Wê hêvî û bîranînên me jî
            Bibin mar û dûpişk

## Jiyan (2)

Her kes dizane
            Ka ew çi ji jiyanê dixwaze
Lê ka ew mirovê bizane
                        Ka jiyan çi ji wî dixwaze!

# Baran (1)

Baranê!
Ey rondikên xwedayî!
Bi xwe dizanî çendî ciwan û buhayî
Ji canê çem û kaniya tu çêdibî
Mîna dura; libo libo ber hev dibî
Roj bi rojê mezin dibî
Gav bi gavê bilind dibî
Tu nawestî û ranawestî
Ta ku li ba asîmanê jor dibestî
Careke dî evîndarê
Ji bilindiya xwe tê xwarê
Dema tu bihriya me dikî
Xwe tevlî vê axê dikî
Jiyana xwe guhrî jiyana me dikî.

## Baran (2)

Gelo tê çi sûdê ji baranê bikî
Ku te tiştek neçandibe

# Pîrê (1)

Pîrê!
Te dizanî?
Ku ez çendî li hêviya te dimam
Ta ku te nivêja Eşayê dikir
Sinnet û Terawîh dikirin
Û werd jî dikişandin
Çendî ez li dora siccada te dizîvirîm
Û li benda te dimam
Da ku tu dest bi gotina çîrokê bikî
Tevî ku min dizanîbû
Dê tê çi jî bêjî

## Pîrê (2)

Pîrê!
Çendî min lavlav ji te dikir
Da ku tu devê sindtrûka xwe
Li ber min vekî
Tevî ku min dizanîbû
Ku ji çend buxçikên pînekirî
Çend lûfik
Çend şûjin û derziyên ser bi kuh
Û hinek qajik û benîştê hişk
Pêve
Tê de tune bûn jî

# Tîpên min

Ku rojekê tîpên min
Benê pingên xwe biqetînin
Wê bi cîhanê bikevin
Gav bi gav wê bi pelînin
Wê di her sîngeke mirî de
Hêviyeke nû biçînin
Ku rojekê ev tîpên min
Ji zindana xwe derkevin
Wê bi va kolanan bikevin
Wê tev xwe bikin xetîre
Di tariya de vêkevin

# Salara derda me

Her ku şev çarika xwe ya reş
Digire ser çavê jiyanê
Ez derdên xwe şiyar dikim
Wan li dora xwe dicivînim
Bi wan re
Didim û distînim
Careka dî
Wan ji hev dixînim
Hineka ji wan surgon dikim
Hineka serjêdikim
Hineka zindan dikim
Hineka di xew re dikim
Hineka kovî dikim
Hineka têr dikin û
Hineka birçî dikim
Hineka qels dikim û
Lê bê goman, tim
Hineka dihêlim ji xwe re
Wan delalî dikim û di
Dilê xwe de xwedî dikim û
Mezin dikim

# D A R A M A Z Î

Gelo hûn dizanin
çend bivir kuh dibin
Ta ku
Darek ji dara mazî
Tête birîn!?

# Dayê

Di bîst saliya wê de
Hewî bû şûjinek di
Perda dilê wê re şêleha
Heft sala şiwê wê
Pişta xwe dayê
Çar zarok ji şeşan bingor kirin
Dê û bav û bira
Ji jiyanê koç kirin
Ewê bi xwe jî êş û jana sih û sê sala
Ji temenê xwe yê bê temen
Di nava buxçika mirinê de girêda
Û du sêwî
li sêwiyên cîhanê zêde kirin
Vêca ezê çewa û di çi rê re
Hinek bextiyarî
Bighênime dilê wê.

# Çi bikim

Hêviyên min
Bi kerwanê derdan re diçim
Bazirganiya xewnên sitewr
Her sibeh
Hezarên pirsan
Li ber deriyê min radiwestihin
Ez bi  xwe jî nema dizanim
Ka çend rû ji yek gotinê re hene!

# Bîranîn

Hende bîranînê me li ba me buhane
Ji me heye ku bi zêra jî nayên kirîn
Dema ku
em wan dadixin sûka jiyanê
Ne kes wan dikire
Û ne jî kes wan bazar dike
Dîsa em wa bi xwe re hildigrin
Di bin çermê xwe de vedişêrin
Û bi hestê xwe wan dinixumînin

# Her ku

Her ku ez guhê xwe mecbûrî
Bihîstina çend stiranên filiklorî dikim
Hew dibînim ku
Keriyek ji bîranînin têhn
Êrîşî herdu kehniyokên
çavê min dikin
Têr ji wan vedixwin
Di nav pêlên wan de digevizin
Li dora min têne hev
Li min dibin yek
Min bi xwe re
Hildifirênin
Bi şûnde vedigerênin
Qûnaxa çil salî bi gavekê de
Min li dayika min vedgerênin.

# Birayê
# Ereb

Ey birayê Ereb!
Ji xwe ke wî kirasê kevin
Naske êdî kiye dost û kiye
dijmin
Derke ji dilê xwe wê rika pîr
Da karibim
bidrûm devê wê birîna kûr..

# X
# E
# L
# A
# T

Xelat a min ji hemî mirovên
Ku mirovatiyê diparêzin re
Ev "helbest in"
Heger kesek bi wan qayil nebe
Ezê wan diyarî xwe bikim.

# Rûpel

Çendî dilê min
Bi van rûpelan dişewite
Dema ku ez tîpên xwe
Yên mîna birûskên agir
Di hinavên wan de diçînim.

# M A M I K

Ez keça vê kelhê me
Kulîlka vê qadê me
Kilê çavê dîmenê me
Dilê vê jînê me
Kelemê vî çerxî me
Zanim û we zanî ez kî me.

# Kuhnevanek

Kuhnevanekî
Ji berpirsiyarê xwe re got:
Ezbenî, weke hewe gotî me kir.
Berpirsiyar lê vegerand:
- De vêca herin berevajiyê wê bêjin.
Roja dî:
- Ezbenî me weke vajiya duhû got.
- De vêca herin ya we pêr gotî lê vegerin.
- Ezbenî, li xwe hay bûne, ku em serê wan ji gotinên vala dadigrin. Doza rastiyê li me dikin.
- Kuro, de çêtirîn derew hilbijêrin û bidin dest wa.
- Ezbenî, ji destê me negirtin, û derî jî li me venekirin. Ji rastiyê pêve napijirênin.

- Kuro, de ji wan re bêjin: Rastî di zikê sibê de ye. Heger hat wê bi xwe re bêne.
- Ezbenî, ji me dixwazin em nîşan bikin kîjan sibe!.
- Kuro, de ……………?!

# KURSÎ

Kursî çav ji xwe re çênekirin
Da ku kesî nebîne.
Guh ji xwe re çênekirin
Da ku denga nebihîze.
Can neberda laşê xwe da ku
Ne êşe
Ne westehe û
Siwarê xwe ji ser pişta xwe
navêje.

# Azadî (1)

Her ku
Ji xewneke azadiyê şiyar dibim
Ji min heye ku azadî
Li pişta derî
Li hêviya min rawestihaye.
Piştî bihnekê
Dibêjim: Na, di navbera min û wê de çend gavin; yan jî çend katjimêrin.
Ta dibe nîro, dibêjim: Na, çend rojin yan çend mehin.
Ta dibe êvar, dibêjim: Na, çend salin, yan çend temenin.
Li hêviya xewneke nuh dimînim
Da dîsa
Di nava derya evîna azadiyê de
noq bibim.

## Azadî (2)

Di zemherîra tehlî û tengiyê de
Ez xwe li ber agirê baweriyekê tenê germ dikim;
Ewa ku dibêje: Azadî jî li me digere
Her wekî ku em lê digerin.

# K I R A S

Ew kirasê ku me
Par ji hêviyên xwe re dirûtî
Îsal li bejna wan nayê

# PAKREWAN

Her dilopek ji xwîna şehîdekî
Deryak ji gemara bindestiyê dişo

# Di nexweşxanê de

Perde
Ji ser cendekê wî avêhtin
Ji dê pirsîn: Ev kurê te ye?
Bi serê xwe bersiv da: belê
Careke dî serbaz bi hêz
Milê wê girt û hejand:
- Baş binêre, ev kurê teye?
Beşişî û dîsa…
bêdeng bersiv da..
Kurê min e.
Cendekê kurê xwe li milê xorta kir
Bi dû wa de…. Hê….dî… hêdî
Dadiket û digot: Hey dijminê bêbext
Te dixwest ku .. tu bi hêstirê min şabibî…… ne wilo??!!.

# Birîn

Her roj
Ez devê birînekê didrûm
Wê kefen dikin û bingor dikim
Da ku ez
Xwe amade bikim
    Ji pêşwaziya
        Birîneke nuh re

*1-sibatê- 2004*

# D A R

Vê darê
Cil û bergên xwe yên kevin
Bi yek carî ji ber xwe kirine
Û avêhtine
Berf û baran
Goşt û hestiyên wê dişo.
Lê xuyaye
Ew mîna min
Ji paşerojê natirse.
Ew bawere ji buharê dema werê
Wê kirasek nuh ji wê re bike diyarî
Mîna hemî darên dî

# M I R O V

Mirovê hêja
Mîna rokê ye
Dema ku ji cihê xwe winda dibe
Di cihekî dî re dide der

# Se
# rm
# a

Tu agirî
tihn neda hest û hestiyên min
Ji roja ku ez
Ji bin guhikê nivîna pîrê Meryem
anîme der.

# Sal
# 1
# 9
# 6
# 6

Sibehekê
Ji xew şiyar bûm
Min dît ku dilê min
Ji cihê xwe hatiye guhertin
Ji koka xwe hatiye hilkirin.
Ji wê rojê ve û ta îro
Ew di cihê xwe de dibeze
Depê rekeha xwe digeze.
1966 sala şûkirina min

# Gulle

Gulle bi xwe nizane
Ka çima ew tê berdan
Û yê wê diberdê kiye.
Dengê xwe nabihîze û
Pêşiya xwe jî nabîne..
Ji lewre
Kî bikeve di riya wê de
Wê bête kuştin.

# Ji cîhanê re

Min ne dixwest
Ku ez di deriya kurdînîya xwe de
Noq bibim û winda bibim
Lê ma çibkim
Tu deryayên dî
Ez hînî avjenîna xwe ne kirim

# Q
# E
# H
# R
# E
# man

Ew ên ku di şevên reş û tarî de
Ji kolanekê diçûne ya dî
Ji malekê diçûne ya dî
Dilê xwe ji wan re dikim xetîre
Û her deh tiliyên xwe vêdixim.

# A

# Ş

# T

# Î

Tevî ku darê zorê
Ji ser pişta situwê aştiyê naye xwar
Lê her û her
Ew destê
Ku rahijtî dar
Dilerize

# Sînga min

Ku hûn çendî
Tîpên nelihevhatî
Kom bikin û
Wan bavêjin
Di rekeha singa min da
Wê li hev werin
Bi destê hev û dû bigirin
Bi ristikên helbestî
Bêne der

# Bihêlin

Bihêlin
        Ez ji welatê xwe hezbikim
        Wek ez dixwazim
Wî bidim nasîn
        Wek çavên min
                Wî dibînin
Bihêlin
Ez di singa wî de
Bijîm û bimrim
Wek
        Ew dixwaze

# Helebçe

16ê meha avdarê 88
Ji nişkave
Mirin li Helebçe bû mêhvan
Bê "izn" û destûr kete hemî mala
Bi lez û bez
Destê xwe avête gerdena
        Bûk û zava
        Pîr û kala
        Dergûş û mendala
Di pênc xulikan de
        Canê bajarekî çinî û
        Perdekî reş girte ser riwê wê
                                                    Û çû

# Ş
# E
# H
# Î
# D

Her dilopek ji xwîna şehîd
Deryak ji gemara bindestiyê dişo.

# Lêborîn

Baş bizane
Ku te karî
        Tu li xwe bibûrî
Wê xelk jî
      Li te bibûrin
Ku xelk li te bûrîn
        Wê Xweda jî li te bibûre.

# Î
# R
# O

Ku tu dixwazî
Roja te ya îro
                Sivik bi rê ve here
Divê tu tiştên dihû
                Li pişta wê bar neke

# Çendî

Çendî min xizan dîtine
Dilê min bi zengîna şewitîye
Çendî min bindest dîtine
Dilê min bi zordara şewitiye
Çendî ez çûme ser miriya
Ez li ser saxa girîme

# Ax

Ax
Ji giriyê bê deng
Ji jiyana bê reng
Ji ramanên bê ceng
Ax
Ji dilê pîr
Ji çavên li riya dûr
Ji gavên bê gav
Ji çavên bê çav
Û ax ji xewa bê xewn
Û ji pariyê bideyn

# Min nedigot: Na

Ku min bikariya
Ez dareke heşîn
Li ber her deriyekî biçînim
Min nedigot: Na
Ku min bikariya
Ez xewneke şêrîn bibînim
Yan, helbesteke xweş bixwînim
Min nedigot: Na
Ku min bikariya
Ez bi derziya xwe
Her pênc parçên Kurdistanê
bi ser hev ve bidrûm
Min nedigot: NaYan min bikariya
Ez rêzên kurda
Mîna tiliya bi destekî ve biçênim
Min nedigot: Na
Û ax ku min bikariya
Kalîn û nalînên
Zarokên cîhanê seranser
Di singa xwe de dîl bikira
Min nedigot: Na

# Hêvî

Bawer kin
Ku bi hêlin
Hêviyek ji singa min biwerihe
Ser tehtekê jî
Wê şîn bibe

# Ez
# Û
# Dijmin

Ez xweş dizanim ku
Tu dijminî
Tu jî baş dizanî ku
Ez ranawestim
Tu laşê min êşkence dikî
Ez jî canê te digvêşim
Tu mal û zeviyê min dixwî
Û ez jî xewa te ya şêrîn direvînim

# Ç
# E
# k

Dema ku dijmin
Bi çekên xwe yên giran
Welatê min hildiweşand
Min jî bi pênûsa xwe
Azadî
Di mişarên va rûpelan de
diçand

# Pirtûka
# Min

Yê ku rahêje pirtûkek min
Û bixwîne
Wê êşek wî bide dest ya dî
Ta ku wî bighînin
Welatê min

# Gelo xewne...!?

Stêrê[(1)] da xwe û rabû.. Çû şevbuhêrka xwişka xwe Gelawêj[(2)].. herdûka milên xwe dane hev ber bi Aso[(3)] ve çûn.. Li wir, her sê bi hev şêwirîn û berê xwe dane Pirseke[(4)] nû.. ji wir jî herçara qesta Zanînê[(5)] kirin.. Wê çaxê rahiştin Gurzek gul[(6)] û berê xwe dane qada şêrîn. Li wir Xunavek[(7)] dilovan bi ser wan de hat. Hingê bûn Gulistaneke[(8)] mezin di hundirê Jîneke [(9)] bi rûmet de.

***1-9: Navên kovarên bi kurdî li Sûriyê dihatin der.***

# Nezanî

Ji nezaniya xwe
me dijmin zana didît
Ji nezaniya dijmin
ji wî hebû ku
dikare miletekî di qutîkekê de biçîne.

# Z A R O K Î

Eve pêncih sale
Ez zaroktiya xwe
Di bin balgihê xwe de di veşêrim
Belkî..
Rojekê,
Leşker ji kolanên me dûr bikevin
Da
Dayika min bibêje:
Tu jî here bileyze.

# Kurmancî

Pir cara
Bextiyarî ber bi min ve hatiye û
Xwe li binguhê kul û derdên min
xistiye
Ta ku xwe nêzîkî dil kiriye
Bi çend zimana silav lê kiriye
Dema ku bersiv ji kurmancî pêve
nebihîstiye
Dîsa bextiyariyê
Berê xwe ji min guhertiye û
Pişta xwe bi min ve kiriye.

# S
# A
# W
# Î
# R

Dema
Ku min
Derdên xwe ji rûpelan re digotin
Min digot qey
Ew ji tu kesên
Dî re
Nabêjin

# Şahî

Ku min karî rojekê tenê
Ez xwe ji xwe winda bikim
Yan bîra xwe ji bîranîna vala bikim
Yan
Ordiyek ji ramanên xwe kedî bikim
Yan vî welatê nîvkuştî
        Ji ser polê xwe peyar bikim
Dibe ku hingê
Ez jî mîna zêndîyekî
Riya şahiyê nas bikim

# Zore

Ev ramanên belawela
Dê çewa wan ber hev bikim!
Dê çewa çil milyon dil
di dilê xwe de bi cih bikim
Dê çewa
Ji dawiya temen destpêbikim!

# Mixabin

Her roj
Gulek jê re di ber biskên xwe re dikir
Her êvar
Gulav li bejn û bala xwe werdikir
Roj bi roj
Gul û beybûn
Ji deşt û zeviyên jiyanê didane hev
Raber dikir
Piştî pêncih salî
Berya koçbar bike bi rojekê jê re got:
Ez bihna nakim

# Kê dîtiye...!?

Komek derd
Di rengê jinekê de
Perengek agir
Di rengê dilekî de
Holeke stewr
Di rengê welatekî de
Xewneke bê ser û ber
Di rengê jiyanekê de…..!?

# E
# z

Heger rojekê ku min nekarî
Ez li ser tu kesê dî bigrîm!
Divê ku ez li ser xwe bigrîm

# Enfal

Erê dayê!
Rondikên germ
hinarkên ruwê te kolane
Têlên zîvîn xwe li keziyên te pêçane
Te jibîrkirye yan jibîrdikî
Ev çend sal û çend zeman e
Her du serî
Li ser balgehkî
Ji hev cudan e
Hîn çavê te ji rêvegerê ne westane
Hîn tu dibêjî zarokên xwe:
Xema nexun,
Hêvî Xwedê
Îro, sibe
Bavê hewe li me mêhvan e
Erê dayê jibîr neke
Berfa giran
Her û her barê çiyan e
Çemê mezin
Her û her barê deryan e
Belê dayê jibîr neke
Zêr û ne zêr
Bi agir ew ji hev xuyane

# D I V ê

Divê dilê te çiya be
Ramanên te asîman be
Singa te deşt be
Hêza te derya be
Deyaxa te bê sînor be
Ta ku
Tu parêzvanê Kurdistan be.

## Hêsrên min (1)

Mirovê ku bi hêsrên min bikene
Bê goman
Ewî tucarî
Şêraniya êşê t'am nekiriye.

## Hêsrên min (2)

Tu qafiwa
        nedin ber cobarên hêsrên min
Bila biherikin
Belkî,
        hinek gemar
                ji kolanên hinek dil
                                        bişon.

# Qamişlo

Qamişloka min
Du demsalên xwe dixwe
Dema ta sar digre
Agirê dojehê wê germ nake
Dema ta germ wê digre
Agirê dojehê jî ji ber wê direve
Bi rastî:
Bajarê min
Ji mêj ve dil bi kul û nexweşe
Lê
Tevî nexweşiya xwe jî
Xweşe.

# Jinek kurd

Jinek kurd im serbilind im
Hunermend im mûm û find im
Bîrewer im j'xwe bawer im
B'rext û ber im tekoşer im

Ez dixwînim ez dibînim
Ez diçînim ez hiltînim
Cerg disojim ez bi doz im
Hem dipoşim dil bi soz im

Gula sor im arê gor im
B'bext û tor im wek Xabûr im
Ez bi nav im hem bi gav im
Li ber çav im weke tav im

Lîlî dikim ar geş dikim
Xwe kar dikim rê xweş dikim
Ez bi maf im b'ax û av im
B'lat û şax im keça bav im

Ez bi vîn im bi evîn im
Dimêjînim dihejînim
Stêra geş im bihna xweş im
Ez bi neqş im wek Laleş im

Bo welatim dil xelatim
J'rohilat im doz felat im
Ez pêdar im xweş li kar im
Pêt û ar im l'rû neyar im

Ez çeleng im b'nav û deng im
Wek piling im li her çeng im
Ez namirim wek agir im
Dê bifirim dê bigirim

Tev bira me l'civata me
Wek çira me l'ser desta me
Ez ne hov im xweş mirov im
Bi dê dirûv im dijî çov im

# K E D Î

Ta ku ez helbesteke xwe kedî dikim
Ez ji canê xwe bi devê wê ve dikim
Bi rondika serê wê dişom
Bi mijangan porê wê şeh dikim
Bi hilma xwe wê germ dikim
Destekî ji wê re dikim doşek
Û yê dî jî bi wê de dikim.

# H A T

Piştî şev li min heft tew bûn
Pişta hêviya
Teweha
Bostek toz li ser soza, sitûr bû
Gavên jiyanê berevajî vegerehan
Ji nû ve hat
Hat
Lê ne ew bû

# Gazindek
# Ji
# jiyanê

Çima ez te ava dikim
Tu min hildiweşînî
Ez bi te re dikenim
Tu min digrînî
Ez te hildidim ser milê xwe
Tu min têxî bin piyê xwe
Ez her roj te ciwan dikim
Tu jî her roj min pîr dikî
Karê min maye ku timî ez te vejînim
Û yê te maye tu jî timî min bimrînî

## Guhtin

Amade me ku heft sala
Wî li pişta xwe bikim
û li dora cîhanê
bigerînim
Yê ku ji min re bibêje
Ka çend rû ji yek guhtinê re
hene.

# Ev roj

Ev roj li pey hev dibezin
Ne pêşya xwe dibînin
Û ne li pişt xwe dinêrin
Pê li hev dikin
Hev dixwin
Ev roj
Bavê xwe jî nasnakin
Û navê xwe jî ji ber nakin.

*Meha (8)an 2003*

**Z**
**E**
**H**
**M**
**E**
**T**
**E**

Zehmete
Ku mirov rondikê xwe daqurtîne
Lê
Zehmetire ku rondikên mirov
Mirov daqurtênin

# Derzî

Vê derziyê çi kiriye û çi nekiriye
Bi vî qelafetê biçûk
karê gêsnekî kiriye
Min bi serê wê yê zirav
devê birçîbûnê dirût û
xizanî bingor kiriye
Çekê min ê giran ew e
Ji xencerekê tûjtir e
Ji hemî gotinên qelew
jêhatî û kêrhatîtir e
Her ku di nav destê min de diçilwile
Xwîna dibin neynûkê bi wê şêrîntir e
Dema derdorê vî cawî nîgar dike
Deşt û beyarên jiyanê tev cuht dike
Bi bejna wê her ez çavê xwe kildidim
Bi kuriya wê sitûna jiyanê hildidim
Ku carekê ji min winda dibe
Bi hewarî
lê digerim
Ta ku ronî ji çav negere
ji wê nagerim
Ez tu carî
wê bi şûrê Şamê naguherim.

# Yê baş

Yê baş ewe
Ku bikare ronahî
Di pişt reşiyê de bibîne
Yê karibe
Şînê di pişt şahiyê de
                    Bibîne
Yê bizane
Rastiyê ji zikê derewê
                    Derîne

# M
# A
# L

Ew mala ku
Banê wê asîmanê şîn be
Dîwarên wê ji çiyayên pîr be
Qada wê ji vê axa sor be
Hosteyê wê ji pêşmergên jîr be
Destê dijmin nagihiyê
Wê ji dev û diranên wî dûr be.

# M I R I N

Hinik çêdibin da bimrin
Û hinik dimrim, da ku bijîn

# Kîn
# Û
# Evîn

Kîn û evîn
Tu carî bi hevre xwedî nabin
Û mezin nabin
Di mişarekê de şîn nabin
Di dilekî de bi cih nabin
Bi hevre na rûnin û ranabin

# Kurê min

Rabe ser xwe kurê min
Ronahiya çavê min
Perçek ji nava dilê min
Semyan û pêmayê min

Rabe û banke xweha xwe
Bişon dest û ruwê xwe
Taze şehkin serê xwe
Maçkin dê û bavê xwe

Werin rûnin bi tevdîr
Bixwin vexwin nan û şîr
Yan hinek hêk û penîr
Yanjî ji vê dimsa tîr

Da xurt bibe laşê we
Ronî bibe çavê we
Baş vebe zanîna we
Bilind bibe bejna we
Cilê xwendinê li xwe kin
Pirtûka di tûrê xwe kin
Desta di destê hev kin
Armancê li pêşya xwe kin

Sûnda min bi serê we
Ava nake warê we
Şahiyê naynê dilê we
Ji bilî zanîna we

# Dîroknûs

Ku tu çûyî welatê min
Pirsê ji kesî neke
Tenê ew şikeft û çiya
Dikarin bersiva te bidin
Ji ber ku ewa bi xwe
Dîroka xwe çêkirine û
Jiberkirine.

## Silîva

Ku tu di axivî
Dev û çavên her tiştî çêdibin û
Kevir jî dikene

## Jîn

Digotin:
Zaro gwîz in û nevî kakil in
Lê
Heçî çav û dêmên Jînê bibîne
Wê bibêje:
Zaro çan in û nevî hingiv in.

## Cana

Ew mirovê ku hîn nizane
Ka çendî ciwanî û şêranî
Li ba Xweda heye
Bila bê te bibîne.

*Silîva, Jînê û Cana: neviyên minin.*

# Yek
# Bi
# Yekê

Ev e sih sal e
Ez helbestê xwedî dikim
Û mezin dikim
Bi gomanim
Vêca ewê
Min hilgire û
        Mezin bike

# Nalîn

Min êzgih vemirand
Da nalîn newêne guhê min
Min televizyon vemirand
Da dengên nalînan nebihîzim
Min derî û pencere jî hemî girtin
Da ku dengê nalînan hew bê Min
Di dawiyê de
Li xwe hay bûm;
Ya ku dinale … ez im.

# Şev (1)

Her ku şev radize
Û ez şiyar dibim
Dizanim ku
Ezê îşev dilê xwe
Bikim çênî çênî
Di mişarên van rûpelan de
Biçênim

# Şev (2)

Gelo şev ji kê re ye!?
Ji mêrkuja re ye
Yan ji diza re ye
Yan ji xewê re ye?
Lê xew çiye!?
Dibe ku rengek ji rengên mirinê be
Şevreşiyê bi ser xelkê de belav dike
Da ku çavên wan
Ji tîrojên rojê vehesin
Lê… gelo…
Yê ku jiyanê nebîne
Wê çewa bizane
Ku roj çû û şev hat!

# Dem

Ey dema çikûz
Demekê bide min
Da bi xwe re rûnim
Pirêza salên bûrî
Bipelênim
Rojên sax û mirî
Ji nav
Hevûdû derînim
Ji nûve ezê
Hêviyên xwe yên ciwan
Di mişarên rûpelan de
Biçînim

# Ç
# A
# V

Mirovê ku
roniyê ji çavên xwe winda dike
Ji kolanan ditirse.
Mirovê ku
roniyê ji dilê xwe winda dike
Kolan ji wî ditirsin.

# Ê
# T
# Û
# N

Ku mirov di nava êtûnê de be
Çêtire ku êtûn di nava mirov de be

# Tirsa
# Mezin

Tirsa minî herî mezin ew e ku,
Rojekê valehî jiyana min tijî bike.

# Xurtî

Îro min zanî
Ku ez vê jînê
Bi dav û benda bigrim
Wê kedî bikim
Xwedî bikim
Mezin bikim
Bi zîn û zengo bikim
Dîsa jî
Wê xurt
Wê ji min bistînin û
Barê xwe li pişta wê bikin

***02.05.2005***

# Xwezî

Xwezî bihnvedana minî dawî
Li ber dîwarekî
ji dîwarên gundê me ba

**Ji Weşanên Êkîtiya Nivîserên Kurd - Duhok**

1- Nivêjek mestan e li dor gunbeda Cizîrî/ vekolîn, Dr. Fazil Umer- 2004
2- Xewnên tazî/ helbest, Ruxuşê Zîvar- 2004
3- Wexerek di nihêniyên deqî da/ rexne û vekolîn, Yasirê Hesenî- 2004
4- Biyavê xwandinê/ vekolîn, Celal Mistefa- 2004
5- Liber derazînka têkstan/xwandinên wêjeyî, Selam Balayî- 2004
6- Xwandingeha birisîkirinê/ çîrok, Sedîq Hamid- 2004
7- Hizir û dîtin/ hizir û rewşenbîriya kiştî, Dr. Arif Hîto- 2004
8- Çend riyêk bo deqî/ vekolîn, Sebîh Mihemed hesen- 2004
9- Berperekê winda ji jiyannama Selîmê Esmerê/ çîrok, Anwer Mihemed Tahir- 2004
10- Çend xwandinek şêwkarî/ vekolîn, Star Elî- 2005
11- Janên sînahiyê/ roman, Tehsîn Navişkî- 2005
12- Qîses min bîlad al- Nercis, Hesen Silîvanî) çapa duyem 2005
13- Gotarên rexneyî/ komele witar, Hoşeng Şêx Mihemed- 2005
14- Geriyanek di nav baxê edebê kurdî da, Reşîd Findî- 2005
15- Sotingeh/ roman Bilind Mihemed- 2005

16- Siyapoşê zêmarî/ çîrok, De- Fazil Umer- 2005
17- Şanoya hevçerx û çend dîtin/ Siyar Temir- 2005
18-Viyan di demekê jandar da/roman, Mihsin Abid Al- rehman- 2005
19- Teknîka vegêranê di kurte çîrokên (Fazil Umerî de) vekolîn, Nefîsa Îsmayil- 2005
20- Mîrî û kevok/ çîrokên zarokan, Dr. Abidî Hacî- 2005
21-Hejde çîvanokên gurga/çîrok, B. Mihemed Abidallih (çapa diwem)- 2005
22- Rustemê Zalê/ filklur, Dr. Arif Hîtu (çapa diwê) - 2005
23- Şihîna çiyayê spî/ kurte çîrok, Nizar Mihemed seîd- 2005
24- Cemiserê siyê/ kurte çîrok, Salid Salih- 2005
25- Ey roj neçe ava/ pexşan, Selam Balayî- 2005
26-Ji rewşenbîriya kurdî/ vekolîn- gotar, Nacî Taha Berwarî- 2005
27- Zarokên cîhana aştî û aşopê/ vekolîn, Hizirivan Abiduallih- 2005
28- Dihok di serboran de/ bîrewerî, Sedîq Hamid- 2005
29- Cak dirêda û helweşandin/ vekolîn, Dr. Fazil Umer- 2005
30-Dawiya şervanekî/roman, Îsmet Mihemed Bedel- 2005
31- Pêlên rexneyî/rexne, Nimet Allih Hamid Nihêlî- 2005
32-Dema hêşta giyanewer dişiyan baxivn/ çîvanokên millî, W- Hecî Cefer- 2005
33- Ber bi deqê xomalî/deq û şirovekirin, Îbrahîm

Ehmed Simo- 2005
34- Mêmêtîkis, ji hizirikirinê ta ku aydyolociyayê/ Dr- Fazil Umer- 2005
35-Kelitor-Nasyonalîzim û erebkirin/ vekolîn, Ebdal Nurî- 2005
36- Peyvên bê perde/ vekolînên rexna edebî, Ebid Alxaliq Sultan- 2005
37-Nivistin di çavê nêrgzê da/ helbest, Beşîr Mizûrî- 2005
38- Ji felsefa berxudanê/ helbest, Remezan Îsa- 2005
39- Ewê dijî hemiya/ kurte çîrok, Sebîh Mihemed Hesen- 2005
40- Nijiyargerî/ Dr. Fazil Umer- 2005
41- Bîst sal û êvarek/ roman, Sebirî Silêvanî- 2005
42-Nivêsîn di navbera nivîserên xwedawend û lêgeryan li azadiyê/ vekolîn, Hoşeng Şêx Mihemed- 2005
43- Ji çîrokên millî yên filklorî/Cemîl Mihemed Şêlazî- 2005
44-Cewahir Al-mubdeîn/munaqeşat adbiye, Îsmayil Badî- 2005
45- Dîmenên peçnî/ çîrok, Kîvî Arif- 2005
46- Tîr ji kivana diweşiyên û ber tîne min/ helbest, Selman Kovlî- 2005
47- Kevalekê rwîs/ helbest, Şukirî Şehbaz- 2005
48-Dewlet û eşqeka kevnar/ helbest, Deyka Daliyayê- 2005
49- Şevên bê xew/ helbest, Beyar Bavî- 2005
50- Arzandina bendemanê/ Hizirivan- 2005
51- Çaxê roj dipeyvît/ helbest, Şemal Akireyî- 2005
52-Dû çemkên havîbûn yaxîbûn/ Emîn Abid

Alqadir- 2005
53- Rastî û talan/ Sibihî Mirad- 2005
54- Deftera bê gunehiyê/ helbest, Ebid Al- rehman Bamerinî- 2005
55- Ziman û zimanvanî/ Ebid Al- Wehab Xalid- 2005
56- Evîn, xem û mirin/ helbest, Teîb deştanî- 2005
57- Zindana biçûk/ helbest, Ezîz Xemcivîn- 2005
58-Aşiq di behşteka yutubiyayî da/ helbest, Mistefa Selîm- 2005
59-Ezê di hembêza henasên te de/ çîrok, Îsmayil Mistefa- 2006
60- Roman li devera behdînan/ vekolîn, Remezan Hecî- 2006
61- Raya giştî, têgeh û pênasîn û guhorîn û pîvana zanistî/ vekolîn, Mislim Batêlî- 2006
62-Helbesitên rengîn/helbest, W:Tengezarê Marînî- 2006
63- Tevnikera kurd, hunermenda berze/ vekolîn, W: Mesûd Xalid Gulî- 2006
64- Çapeneniyêt rewşenbîrêt devera behdînan (1935 - 2000) bîlografiya, Wesfî Hesen Ridênî- 2006
65-Şeva firîşte revîn/ çîrok, Îsmayil Silêman Hacanî- 2006
66-Gilolika aliziyaî, îdiyemên kurdî, Xalid Salih- 2006
67- Nivêjeka baranê, helbest, Heval Findî- 2006
68- Roj, helbest, Hişiyar Mihemed Hesen Rêkanî- 2006
69- Ayirdeyên viyanê, helbest, Bilind Mihemed- 2006

70- Derdê evînê(nuvlêt) Yûnis Ehmed 2006
71- Efsaneya stiranên bindesitiyê, Necîb Balayî-2006
72- Xewneka emirîk (kumeka çîrokên Ezîz Nesîn) W: Xeyirî Buzanî 2006
73- Hizirînek di zimanê kurdî de, Reşîd Findî
74- Xanî mamustayê siyemîn, Mem Şerîf- 2006
75-Ji awazên ciwaniyê, helbest, Nacî Taha Beriwarî-2006
76- Çend belge name yên mîjwî li dor kurdan, Dr. Selah Hirurî- 2006
77- Meşa bûkan, helbest, Hêvî Berwarî- 2006
78-Ew zelamê digel xwe ji yek cuda, şano, Siyar Temir
79- Pelên eşqê, helbest, Dirbas Mistefa- 2006
80- Şevên sar, roman, Hesen Îbrahîm- 2006
81- Helbest bo delalê, helbest, Xalid Hisên- 2006
82- Balulka şekirê, kurte çîrok, Hesen Silêvanî- 2006
83- Heyranok namên evîndaran, fulklor, Edîb Abidullah- 2006

84- Mirin di qişleya padşahî de, kurte çîrok, Mihsin Ebid Al- rehman- 2006
85- Cîvanoka gayê sor, fulklor, Cemîl Mihemed Şêlazî- 2006
86- Selwa hêj belalîske, helbest, Loqman Asîhî- 2006
87- Bilîcan, roman, Perwîz Cîhanî- 2006
88- Lê,ilîxana goveyî,çîrok, filiklor,Mistefa Bamernî
89- Vegre- Roman, Şahîn Bekir Suwereklî- 2006
90- Qedera min- helbest- Selman Şêx Memê- 2006
91- Bihnişk- Folklor,Mihemed Hesen Binavî- 2006

92- Armanc- helbest, Sebrî Hekkarî- 2006
93- Bakurê Dil- helbest, Dilşa Yusif- 2006
94- Xwenek Binevşî- çîrok, Îsmet Mehemed Bedel- 2006
95- Nehîniyên Xamey- helbest, Sebrî Nihêlî- 2006
96- Henasek Di Peristgeha şiirê de, xwendinên wêjeyî, Selam Balayî- 2006
97- Şoreşên Barzan- helbest, Heydar Metînî- 2006
98- Aşqa me çiryeka zerdeştiye, Îsmaîl Mistefa- 2006
99- Tenhistan- helbest, Kemal Silêvaneyî- 2006
100- Şaxêd destana Rustemê Zal ê kurdî, Prof- Haçî yê Cundî- 2006
101- Maqalat neqdiye fî nusus el nercis- Mecmuat kutab- 2006
102- Dîwana helbestan, Îsmaîl Taha Şahîn- 2006
103- Dev çi nanbihîsin- çîrok, Têlî Salih Mûsa- 2006
104- Şeveka bê nivêj- helbest, Layiq Cemal- 2006
105- Paradoksîzim- lêkolîn, Îsmet Xabûr
106- Dosya Barzanî-lêkolîn, Wezîrê Eşo-2007
107- Helebçe- helbest, Seydayê Keleş- 2007
108- Çavên Sîtavkê-roman , Tehsîn Navişkî- 2007
109- Bakurê Helbestê- Antolojiya, Arjen Arî- 2007
110- Awazên Mirinê- çîrok , Nefîsa Îsmaîl Tahir- 2007
111- Sore birîna şeva min- helbest, Selwa Gulî-2007
112-Aşq di xelwetgehên mirinê de-helbest ,Aştî Germavî-2007
113- Sirûdên rojihilatî-çîrok, Celal Mistefa-2007
114- Aryana Sînorên Dûr-helbest, Mesûd Xelef- 2007

115-Awazên xameyî/ lêkolîn û rexne, Nîametûlah Nêhêlî, 2007
116 - Beyta sîseban/ Hizirvan, 2007
117- Ger tu mabayî/ helbest, Selman Şêx Memî, 2007
118- Leşê şevê/ helbest, Selam Balayî, 2007
119- Dalehiyên kesekê bi tenê/ çîrok, Dr. Arif Hîto, 2007
120- Çend hizirên rewşenbîrî/ gotar, Nacî Taha Berwarî, 2008
121- Helkolîna zimanî/ vekolîn, Dr.Fazil Omer, 2008
122- Xewneka kîvî/ helebest, Deyka Daliyayê, 2008
124- Petromkirina gunihan/ çîrok, Mihisin Ebdûlrehman, 2008
125- Rojanên şêtekî/ çîrok, Edîb Ebdûlah, 2008
126- Roj ava dibît, da bihilêt/ helbest, Sedîq Xalid Hirorî, 2008
127- Bajêrê dînan û çend çîrokên din/ karîketore çîrok, Têlî Salih, 2008
128- Evîn û stiran/ helbest, Fêsel Mistefa, 2008
129- Govenda jînê/ , Dr. Xeyrî Neamo, 2008
130- Kepeza xewnan/ çîrok, Xmegînê Remo, 2008
131- Bender/ helbest, Diya Ciwan, 2008

www.duhokwriters.net

# Naverok


Diyarî ........ 5
Xewneke azad ........ 6
Welat ........ 7
Barzanî ........ 13
Helbesta min ........ 14
Ez û helbest ........ 17
Helbestvan ........ 18
Helbestvano ........ 19
Evîna mezin ........ 20
Evîna Duhokê ........ 21
Evîn ........ 22
Dilê min ........ 24
Pênûsa min ........ 25
Pênûs ........ 27
Gul û zindan ........ 28
Gul ........ 29
Gulav ........ 30
Jiyan ........ 31
Baran ........ 32
Pîrê ........ 33
Tîpên min ........ 34
Salar a derda me ........ 35
Dara mazî ........ 36
Dayê ........ 37
Çi bikim ........ 38
Bîranîn ........ 39

**Her ku** .......... **40**
**Birayê Ereb** .......... **41**
**Xelat** .......... **42**
**Rûpel** .......... **43**
**Mamik** .......... **44**
**Kuhnevanek** .......... **45**
**Kursî** .......... **46**
**Azadî** .......... **47**
**Kiras** .......... **48**
**Pakrewan** .......... **49**
**Di nexweşxanê de** .......... **50**
**Birîn** .......... **51**
**Dar** .......... **52**
**Mirov** .......... **53**
**Serma** .......... **54**
**Sal 1966** .......... **55**
**Gulle** .......... **56**
**Ji cîhanê re** .......... **57**
**Qehreman** .......... **58**
**Aştî** .......... **59**
**Singa min** .......... **60**
**Bihêlin** .......... **61**
**Helebçe** .......... **62**
**Şehîd** .......... **63**
**Lêborîn** .......... **64**
**Îro** .......... **65**
**Çendî** .......... **66**
**Ax** .......... **67**
**Min nedigot: Na** .......... **68**
**Hêvî** .......... **69**
**Ez û dijmin** .......... **70**

Çek ........ 71
Pirtûka min ........ 72
Gelo xewne ........ 73
Nezanî ........ 74
Zarokî ........ 75
Kurmancî ........ 76
Sawîr ........ 77
Şahî ........ 78
Zore ........ 79
Mixabin ........ 80
Kê dîtiye ........ 81
Ez ........ 82
Enfal ........ 83
Divê ........ 84
Hêsrên min ........ 85
Qamişlo ........ 86
Jinek kurd ........ 87
Kedî ........ 89
Hat ........ 90
Gazindek ji jiyanê ........ 91
Guhtin ........ 92
Ev roj ........ 93
Zehmete ........ 94
Derzî ........ 95
Yê baş ........ 96
Mal ........ 97
Mirin ........ 98
Kîn û evîn ........ 99
Kurê min ........ 100
Dîroknûs ........ 101
Silîva - Jîn - Cana ........ 102

Yek bi yekê ........ 103
Nalîn ........ 104
Şev ........ 105
Dem ........ 106
Çav ........ 107
Êtûn ........ 108
Tirsa mezin ........ 109
Xurtî ........ 110
Xwezî ........ 111